GLEICHE RECHTE FÜR ALLE

HERKES IÇIN EŞIT HAKLAR

РАВНЫЕ ПРАВА ДЛЯ ВСЕХ

HEMAN MAF JIBO HER KESI

L'EGALITE DES DROITS POUR TOUS

تساوى الحقوق للجميع

DIE LINKE.

www.dielinke-nrw.de

Hilbijartin mafeke bingehîn e Ji bo hemû koçberan mafê hilbijartina herêmî!

Hemû şaredarî ji bo koçberên ji welatên din hatinin, cîhgehên jibi bihevrejiyanê zor girîngin. Entegrasyon tenê bi zanîna ziman û karbidestxistinê nabe. Eger koçber xwedanê hemû mafên piraniya civakê be, dikane bibe parek civakê.

Li NRW (Rhein Westfalya bakûr) beşek girîng ya civakê (bi qasî 1,25 Mill.) hinek ji wan bi dehan salan e, ji mafê bingehîn ê polîtîk, civakî û dadmendî bêpar hatine hiştin: Ango ji mafê hilbijartin û xwe hilbijartinê. Her çendî ev mirovon buna beşeke ya vê civakê jî, nikarin disa di nav çarçoveye hibijartinên şaredariyan de jî tev li dengdanê bibin. Ji ber ku di yasaya bingehîn de mafî hilbijartinê tenê ji bo hemwelatiyê alman hatiye pejirandin.

Ji nîvê salên 1990 î u virve di warê »mafê hilbijartina tenê ji bo almanan« de rêyekê awerte ji bo hemwelatiyên endamên Yekitiya Ewropa (YE) hatiye vekirin. Ew dikarin, di hilbijartinên şaredarî û parlamana Ewropa de beşdari dengdanan bibin. Di eyalete NRW de tenê bi qasî 560 000 kes ji vê mafê awerte sûd werdigirin.

Lê koçberê ji welat û dewletên ne endamên YE ne, ji vê mafî bêpar in. Em dixwazin vê newekhevînê biguherînin! Em di vî warî de ne tenê ne, tevgereke fireh ya ji nûnêriyên koçberan, sendîqayan û şêwirmendiyên biyaniyan pêk tê, heye. Hinek şarederî, encûmenên navçe û bajaran jî ji bo vî mafî amade ne u gelek bîryar dayina. Divê ev nîqaş u pêvajoka polîtîk a erêni bê navber bidomê.

Ti mirov ne îllegale!

Hemî mirovên ku ji ber derfetên zeqt û zehmetî hatine vî welatî, pêwistîya wan bi alikarîya me heye. Zirufên ku ji bo dayîna îcazeta runetanê hewqasî zehmetin ku bi şerde di bin bandora krîza aborî a îroda, tew ne îmkane ku ew werin şunda. Jibo vê yekê em bêjin pêwista ku tu mirov bila ji vî welatî neyê dersînorkirin.

Heman mafên civakî û polîtîk ji bo her kesî!

Li gor ditina DIE LINKE. NRW mafê hilbijartinê jibi biyaniyan li şaradariyan tê weteya bingehekî navendî yê tevlêbûne bîryargirtin u pêvajoya demokratîk. Koçberên ne ji welatên YE yê jî mafên xwe hene ku tevê biryaran bibe, di piştgiriya behevrejiyanê de bikare hêz û azmûnê xwe tevê bike. Bidestxistina mafê herêmi, dê yek ji wan kêmasiyên demokrasiyê were rakirin û bondora polîtîkê ji bo giştan wê bi hêztir bêta kirin.

Afirandina dadmendiyeke rasti, wekheviya di warê polîtîk, civakî û çandîde jibo hemû mirovên li vir dijîn, armanca me ye. Wekhevbûn û piştgiriya bihevrejiyanê ji bo hemû mirovên li war û wargehên NRW pir girîng e. Li ser vê bingehê em weke DIE LINKE. NRW daxwaz dikin ku:

- Di Kîta (bistanên zarokan) û dibistanan de hê zêdetir xizmetên teşvîkî ji bo zarokên koçberan hebe
- Di girtina karmendên nû de bi taybetî ji bo rêveberiyên saziyên şaredarî û civakî, divê girtin li gor rêjeya koçberan pêk were.
- Divê li qada bazara kar de tetbîrên dijcûdakariyê werne girtin û bên şopandin.
- Divê saziyên entegrasyonê xwedanê cemkên biryardayînê be, wekheviyek di navbera wan û komîsyonên encumana şaredariyan de werê danîn, di her biryarên rêvebiriya siyasi u idarida ew jî tevlê bibin.
- Divê komel u rêxistinên koçberan yê xwedî armancê ji bo piştgirî û hevkariyêne bi awayek vekirî u taybet di warê were teşvîk kirin.

DIE LINKE. Nordrhein-Westfalen
Corneliusstraße 108, 40215 Düsseldorf
Telefon: 0211/35 89 07
E-Mail: lgs@dielinke-nrw.de
www.dielinke-nrw.de

V.i.S.d.P. Katharina Schwabedissen